

Medrese ve İlahiyat Kavşagında
İSLÂMÎ İLİMLER
(Uluslararası Sempozyum)

المؤتمر الدولي للعلوم الإسلامية بين المدارس الإسلامية التقليدية
والكليات الحديثة المعاصرة

Islamic Sciences at the Crossroad of Madrasah and Theology
(International Symposium)

29 Haziran - 1 Temmuz 2012
29 June – 1 July 2012

2. Cilt

Editör
Yrd. Doç. Dr. İsmail NARİN



Bingöl Üniversitesi Yayınları
2013

Di Nava Medreseyên Kurdî De Giringiya Medreseya Axtepeyê

Zeynelabidin Zinar¹

DESTPÊKA MEDRESEYA KURDÎ:

Bêguman babeta **Medreseya Kurdî**, pir fireh e û têgihîştina wê ne karekî hêsan e.

Îro rewşenbîrên Kurd bi xwe jî, agahdariya wan a zêde li ser Medreseya Kurdî tune. Ji xwe agahdariya rewşenbîrên cîranên Kurdan (Tirk, Erebi û Faris), hema bêje ji binî li ser Medreseya Kurdî tune.

Pêşî dixwazim vê bibêjim ku "**Medrese**" peyveke erebî ye, ango cihê dersê ye. Kesê ku ders dide jî, jê re bi kurdî **SEYDA** tê gotin. Ev peyvika **SEY**ê bi kurdî navê dersê ye, peyvika **DA**ê jî lêkera dayîne ye, yanî kesê ku ders dide.

Çewa ku tê zanîn, **medrese** cara pêşî li bajarê Medîneyê sala **622**yên Zayîne vebûye û tê de tenê xwendina olî hatiye dayîn. Piştê her ku çûye, medrese li hin welatên ku ola Îslamê pejirandine jî, hatiye vekirin.

Medreseya pêşî li Kurdistanê, di sala **950** de li bajarê **Hemedanê** vebûye û hin bi hin ew sazî li herêmên kurdnişîn belav bûye.

Rewşenbîrê pêşî ku ji vê Medreseyê derketiye **Baba Tahir Hemedanî** (938-1020) ye û jê re **Baba Tahir** Uryanî jî hatiye gotin.

Ew medreseyên Kurdî hetanî dema desthelatiya Siltan Selahedînê Kurdî el Eyûbî (1138-1193) jî, tê de tenê perewedehiya olî dihate kirin. Lê belê gorbihîşt Selahedîn ew medrese dane guhertin û di wan de gelek şaxên zanistiyê bi cih kirine, perwerdehiya di wan de jî wek ya zanîngehên demî daye domandin. Siltan Selahedin ew sistema Medreseya Kurdî biriye li Qahîreyê jî bi cih kiriye. Bi vê xebata

¹ Stockholm [pencinar.z@gmail.com].

Siltanê Kurd gelek rewşenbîrên mezin hem ji Medreseyên Kurdî û hem jî ji yên li Misrê derketine qada jiyânê.

⋮

Ev babeta ku ez ê niha bibêjim, çendî ku rasterast ne girêdayê bi naveroka Medresê ve ye, lê di gotinê de sûdeke mezin heye:

Dema Selahedînê Kurdî û piştî wî jî, ew bipêşveçûna Medreseya Kurdî, li hesabê hin hêzên dîktator neçûye. Ji ber hindê di Sedsala 13,14 û 15yan de, piraniya wan Medreseyên Kurdî ku şûna zanîn û irfanê bûne, hatine şewitandin û talan bûne. Xasma jî medreseyên li herêma Diyarbekirê (1250), Xelat, Şarezûr û Hewlêrê, ji aliyê Mogolan ve, piştê jî ji aliyê leşkerên Tîmorleng (1386–1403) ve hatine şewitandin. Îcar medreseyên ku ji ber şewitandina wan filitîne jî, îcar ji aliyê Sefewiyan ve (1501) hatine şewitandin.

Sê şahên Sefewî, ji bo ku Kurd nebûne Şîa, bi dehhezaran Kurd kuştine û medreseyên wan şewitandine.

Şahên ku Kurd qetlîam kirine, ev bûne: **Şah Ebbas Sefewî**, **Şah Îsmail Sefewî** û **Şah Tahmasp Sefewî**.

Ji ber hindê ye ku **Mewlana Idrîs Bedlîsî** û **Selîmê** ku piştê bûye Siltan, di 1514an de, peymanek bi navê **Peymana Amasyayê**, li ser bingeha biratî û hevkarîya Kurd û Tirk îmze kirine.

(http://ku.wikipedia.org/wiki/Peymana_Amasyay%C3%AA)

Ew biratiya Kurd û Tirk, 125 sal bêkêmasî domandiye. Lê di 1639an de îcar Sefewî û Osmanî bi **Peymana Qesra Şêrînê**, axa Kurdistanê di navbera xwe de dabêş kirine. Bi wê yekê bêhizûrî ketiye nêv Medreseya Kurdî jî.

Lê dîsa jî ew Medreseyên Kurdî yên ku li aliyê Osmanîyan mabûn, hetanî dawîya Sedsala 18an jî, jiyana xwe di binê desthelatiya mîrên Kurd de domandine.

Lê mixabin di Sedsala 19an de, astengî ketine pêşîya Medreseya Kurdî. **Sedsala 20î** jî, ji xwe hem ji bo Kurdan û hem jî ji bo Medreseya Kurdî, wek **Sedsala Reş** hatiye binavkirin.

⋮

Hêjayê gotinê ye ku ez li virê bêjim:

Mele Seîdê Kurdî (Bedîuzzeman) 800 sal piştî Selahedînê Kurdî yê Eyûbî,

xwestiye ku eynî guhertina ku gorbihîşt Selahedîn di Medreseya Kurdî de kiribû, bide kirin. Lê mixabin desthelatiya Sitenbolê ew tawanbar kiriye pêşî avêtine girtîgehê, piştî jî wek "şê" wî bi nav kirine û avêtine tîmarxaneyê.

Me li jorê behsa **Sedsala Reş** kir. Di vê sedsalê de, xasma jî ji 1926an bigir hetanî sala 2002yan, Rejîma Kemalîzmê bi hovîtiyeke mezin êrîş biriyê ser medreseyên Kurdî û berhemên bi zimanê kurdî kirine tune. Xasma jî di dema wan cuntayên leşkerî ya 1961, 1971 û 1980yî de, gelek berhemên kurdî hatine şewitandin.

Îcar dema em li mêjû mêzedikin, em dibînin ku Medreseyên Kurdî û berhemên bi Zimanê Kurdî, ji aliyê van çar hêzan ve hatine şewitandin:

- 1- Leşkerê Mogolan.
- 2- Leşkerên Tîmorleng.
- 3- Împeratoriya Sefewî
- 4- Rejîma Kemalîzmê.

DI MEDRESEYA KURDÎ DE ŞAXÊN ZANISTIYÊ:

Pirsa sereke ev e ku heta niha jî rind bi xelkê me nehatiye zanîn ku çend texlît şaxên zanistiyê, di Medreseya Kurdî de dihatin xwendin!

Gelo ev rewş çima nehatiye zelalkirin?

Sedemê nezelaliyê ev e:

Ev e 80 sa in, ku ziman û çanda kurdî ji aliyê Kemalîzmê ve hatibûne qedexekirin û derfet nebû ku rewşên bîrên Kurd ên Sedsala Bîstî vê saziya hezarsale binasin.

Bêguman ev ziman û çanda dewlemend ku heta niha jî hebûna xwe di nava Kurdan de parastiyê, çavkaniya wê di radeya yekemîn de Medreseya Kurdî bûye. Vê saziyê ev e 1.060 sal in ku Neteweyê Kurd û hinek hindikahiyên ku di nava Kurdan de dijîn, rewşên kiriye û perwerdehiya wan li gor mercên demê, di asteke herî bala de daye domandin.

Ji dema Selahedînê Kurdî hetanî dawiya Sedsala 18an, ji 20î zêdetir şaxên zanistiyê yên cuda di Medreseya Kurdî de dihatin xwendin:

- 1- Zanistiya Serf û Nehwa Erebî.
- 2- Zanistiya Tefsîra Quranê.

- 3- Zanistiya Hedîsa Pêxember.
- 4- Zanistiya Mentiqê.
- 5- Zanistiya Edeba Behsê (uslûba axaftinê).
- 6- Zanistiya Meşqê (uslûba nivîsandinê).
- 7- Zanistiya Xweşbêjîyê (waz û nesîhet).
- 8- Zanistiya Belaxetê (ragîhandin).
- 9- Zanistiya Kelamê.
- 10- Zanistiya Hikmetê.
- 11- Zanistiya Qanûnê.
- 12- Zanistiya Feraizê (hiqûqa mîratê).
- 13- Zanistiya Wehdaniyetê (Eqîde).
- 14- Zanistiya Usûlê (tore û urf û adet)
- 15- Zanistiya Heyetê (astronomî û astrolojî).
- 16- Zanistiya Tendurustiyê.
- 17- Zanistiya Hesabê (matematik).
- 18- Zanistiya Felsefê.
- 19- Zanistiya Siyasetê.
- 20- Zanistiya Leşsaxiyê.

Ev şaxên zanistiyê ku behsa wan li jorê hate kirin, li Cihana Îslamî, **tenê di Medreseyên Kurdî de dihatin xwendin**. Lê ew şaxên zanistiyê di medreseyên miletên din ên bisilman de nedihatîn xwendin. **Ji ber ku li ba wan miletan, medrese tenê saziya ol û ayînê bûye. Lê belê li ba Kurdan, medrese ji ol û ayînê zêdetir hêlîna zanîn û zanistiyê bûye.**

Lê mixabin ev şaxên zanistiya Medreseya Kurdî, di van dused salên bihurî de, pir kêmbûne. Demek hatiye tenê 12 şaxên zanistiyê di Medreseya Kurdî de hatine xwendin, piştê jî ew 12 şax daketine heft şaxan.

Ji ber vê yekê ye ku îro jî, Kurd ji hinek meleyan re dibêjin "Melê Dozdeilmî" û ji hinekan re jî dibêjin "Melê Heftilmî."

Di wan Medreseyên Kurdî de, ji cuwanên Kurd zêdetir, gelek cuwanên ji civatên cuda jî dixwendin, weke Erebi, Endonezî, Çerkez, Çaçan, Laz, Gurcî, Faris, Azerî û di sedsala 16 û 17yan de jî, gelek cuwanên Turkman xwendine. Piştê ew kes vegeriyanê welatên xwe û wê zanîn û zanistiya ku ji Medreseya Kurdî wergirtibûn, pê civata xwe rewşen kirine.

SÊ TEXTLÎT MEDRESEYÊN KURDÎ:

Di van sêsed salên bihurî de, sê textlît Medreseyên Kurdî hebûne.

Yek: Medreseyên Mîran.

Dido: Medreseyên Şêxan.

Sisê: Medreseyên Weqfan.

Medreseyên Mîran, gelek bi rêkûpêk dihatin domandin. Lê çi dema ku rewşa siyasî ya wan mîrên Kurdistanê xweş û geş bûye, medreseyên wan jî rind hatine xwedîkirin. Dema rewşa wan a siyasî xirab çûye, rewşa wan medreseyan jî xirab hatiye domandin.

Medreseyên Şêxan jî, ji aliyê du textlît şêx ve dihatin îdarekirin. Yek, ew şêx bûne ku wan bi xwe ders di medreseyên xwe de dane, hem jî ew şêx bûne û rêçikê jî dane meşandine. Lêbelê hin şêx jî hebûne, di zanistiyê de pir ne li pêş bûne, lê wan perwedehiya medreseyên xwe, bi melayên din dane domandin.

Medreseyên Weqfan, ji aliyê weqfan ve dihatin xwedîkirin, hemû lêçû û wekî din pêdiviyên wan ji aliyê weqfan ve dihatin kirin.

DANASÎNA MEDRESEYA KURDÎ:

Çewa ku li jorê jî bi kurtî behs hatiye kirin, mixabin heta niha jî, lêkollog û kurdologan zêde hewl nedane ku lêkolîn li Medreseya Kurdî bikin. Her çi qasî eger hin tişt li ser vê babetê hatibin nivîsandin jî, piraniya wan bi kêmasî û bi çewtî çêbûne.

Medreseya Kurdî gelek caran *bi paşverûtî* û bi *kevneperestî* hatiye nixrandin. Xasma jî di Sed sala Bîstî de, zêdetir jî bi dehfdana Kemalîzm û Komunîzmê, ev bextreşî li Medreseya Kurdî hatiye kirin.

Jixwe ji 1940-45 hetanî 1991ê ango hetanî Belavbûna Yekîtiya Sovyetan, nivşên Kurd ên wan deman jî, bêzî ji Medreseya Kurdî kirine.

Îcar ji ber ku ez wek azbat bi xwe, ji wê çanda Medreseya Kurdî hatime û min dizanibû ku Medreseya Kurdî çiqas dewlemend û xurt e, ji ber hindê min pirtûkek bi navê *Xwendîna Medresê* nivîsî û di 1992an de li Stockholmê daye çapkirin.

(<http://www.pencinar.se/bocker/Nr-14.htm>)

(<http://books.google.se/books?id=u1kNAAACAAJ&dq=Xwendina+Medres%C3>

[%AA&hl=sv&sa=X&ei=4uRbT4TLKOLk4QSSl_S4Dw&ved=0CDcO6AEwAQ\)](#)

Demekurtek piştî derketina vê pirtûka min, bala pir kesan ketiye ser *Medreseya Kurdî* û lêpîrsîn ji aliyê pir kesên pispor ve hatiye kirin.

Ev pirtûk piştî li Zanîngeha Sorbûn (Parîs) û li zanîngeheke Londonê jî wek berhema dersê ji bo xwendevanên inglîz û fresiyan hatiye bikaranîn.

Di 1998an de jî li Parîsê esntîtuyeye navnetewî, kurtiya vê pirtûka min, hem bi zimanê inglîzî û hem jî bi zimanê frensî nivîsiye û xistine nava pirtûkeke 400 rûpelî, bi navê "**Islam des Kurdes**" (2) weşandine.

Serkêşiya vê xebatê jî dostê min Prf. sosyologê Holendî **Martin van Bruinessen** kiriye.

Piştî derketina vê pirtûkê, îcar hem pirtûka min *Xwendina Medresê* û hem jî *Medreseya Kurdî* hêj zêdetir bala rewşenbîrên Kurd û ya gelek kes û saziyên Ewrûpî ketiye ser **Medreseya Kurdî** û medrese ji bo wan bûye qada lêkolîn û lêpîrsînê.

(INSTITUT NATIONAL DES LANGUES ET CIVILISATIONS ORIENTALES, LES ANNALES DE L'AUTRE ISLAM, No 5)

http://books.google.se/books/about/Islam_des_Kurdes.html?id=pvUPAQAAIAAJ&redir_esc=y

ZEMANÊ XWENDINA MEDRESEYA KURDÎ:

Di xwendina Medreseya Kurdî di warê ziman û rêzimanî de, ji destpêkê hetanî dawiyê, jê re **XWENDINA RÊZÊ** tê gotin.

Herweha di Medreseya Kurdî de, derbaskirina wek pol (sinif) ango salane tunebû, lê belê xwendina pirtûkan û kutakirina wan dihate pejirandin.

Xwendina Pirtûkên Rêzê, tev wek zeman, di navbera 15 û 25 salan de dihate kirin. Lê şagirdêkî jêhatî û zîrek, dikaribû di 5, 10 û 15 salan de jî kuta kiribûna.

Zemanê xwendina Medreseya Kurdî, eger em bi xwendina îro re hevber bikin, weha ye: Ji serê dibistanê hetanî dawiya zanîngehê ye.

Ji destpêka Xwendina Medresê heta ku dawî lê dihat, şagird di sê pêngavan re dibihurîn:

Pêngav 1: Destpêka Xwendinê: Ji temenê 5-6 salan dest pê dikir, heta temenê 11 û 12 salan didomand. Ev xwendin, di sawiya dibistana îroyîn de bû.

Pêngav 2: Destpêka Feqetiyê bû: Ev ji temenê 12-13 salan dest pê dikir û heta temenê 17-18 salan didomand.

Ev xwendin, di sawiya navendî û lîseya îroyîn de bû.

Pêngav 3: Di temenê 18-19 salan de dest pê dikir û heta temenê 22-25 salan diqediya.

Ev xwendin, di sawiya zanîngeha îroyîn de bû.

Ji 100î zêdetir pirtûkên ku di Medreseya Kurdî de dihatin xwendin, bi alfabeya erebî bûne. Li dora 20î, pirtûk bi zimanê kurdî bûne. Çend jî bi zimanê farisî bûne, yê dê tev bi zimanê erebî bûne.

Lê belê li hin medreseyan pirtûkên bi alfabeya Krîlî û ya Yunanî jî hatine bikaranîn.

Piraniya van pirtûkên bi zimanê erebî ku di medreyên kurdî de dihatin xwendin, ji aliyê nivîskarên Kurd ve hatine nivîsandin.

Ji ber ku di pirtûkên dersê yê ku ji akiyê nivîskarên Ereb ve hatine zivîsandin, zêde di wan de fikra Wehhabîtiyê hebûye, ji ber hindê hewesa Medreseya Kurdî zêde ji wan pirtûkan re çenedibû.

Piştî ku ev xwendina Medreseya Kurdî diqediya, şagirdê **Îcazeya Medresê** werdigirt. Ev îcaze jî bi şahiyê mezînan dihate pîrozkirin.

Kesê ku Îcazeya Medresê werdigirt, bihêsanî dikaribû hem meletî bike û hem jî ders bide.

ÇEWA KU TÊ ZANÎN, GELEK MAMOSTE û AQILMENDÊN SILTANÊN STENBOLÊ KURD BÛNE Û JI VAN MEDRESEYÊN KURDÎ DERKETINE.

ALFABEYA MEDRESEYA KURD:

Miletê Kurd, di van 3 hezar salên bihurî de, çendî ku 11 alfabeyên cuda bi kar anîye jî, lê belê hin caran bi reqemên **Hesabê Ebcêdê** jî name û kurtenivîs hatine bikaranîn. Lê belê di Medreseya Kurdî de, bi awayekî fermî **Alfabeya Erebî** di radeya sereke de hatiye bikaranîn. Ji vê alfabeyê re jî **Elîfbêtk** yan jî **Elîfba** dihate gotin.

Jixwe diyar e ku Elîfbaya erebî **29** tîp in. Lê eger tîpa **Lam** û ya **Lam Elîflayê** dubare bêtin hesibandin, hingê Elîfbaya erebî dibe 28 tîp.

Ji van 28 tîpan, ên ku rûberê fonetîka zimanê kurdî dikin, tenê 21 in.

Îcar ji ku bo fonetîka zimanê kurdî sererast derkeve holê, zanayên kurd di wan deman de tîpa **Ç, G, J, P** û **Vyê** li alfabeya erebî zêde kirine. Bi vê yekê ew Elîfbaya erebî bûye 34 tîp. Lê ew tîpên ku bi **zêr** û **ziberan** derdikevin holê, weke "**Ê**" bi zêreke berwar û dengê tîpa "**O**"yê jî, bi du "**w**"awan hatine bikaranîn. Li vê gorê ew Elîfbaya erebî ku di medreseya Kurdî de hatiye bikaranîn, bûye 36 tîp.

Lê belê alfabeya Latênî ya ku îro Kurd bi kar tînin, 31 tîp in.

LÎSTEYA PIRTÛKÊN MEDRESEYA KURD:

Di lêkolîneka min a li ser Medreseya Kurdî de, derketiye holê ku di Sedsala 19 û 20î de, jimara pirtûkên dersê ku di Medreseya Kurdî de bi awayekî fermî dihatin xwendin, 89 bûne. Ji van zêdetir, 24 pirtûkên din jî hebûne ku çendî ew bi dersîtî dihatin xwendin jî, lê xwendina wan ne mecbûrî bûye. Li vê gore jimara pirtûkan dibe 113.

Ev pirtûk li gor dabeşkirina şaxan, weha ne:

- 36 pirtûk ziman û rêziman.
- 14 pirtûk alîkarên dersê.
- 12 pirtûk zagon.
- 11 pirtûk Tefsîrên cuda yên Qur'anê.
- 13 pirtûk Hedîsa Pêxember.
- 3 pirtûk Siyer.
- 24 pirtûk Klasîkên Kurdî.

Navê 89 pirtûkên ku li jorê hatiye gotin ev in li jêrê:

1- ELÎFBÊTIK, fêrbûna destpêkê ya bi tîpên erebî. Lê Kurdan tîpa **ç, g, j, p** û **v** lê zêde kirine û li gor fonetîka zimanê xwesererast kirine.

2- QUR'AN: Ji misilmanan re pirtûka asîmanî ya herî pîroz e û xwerû bi zimanê erebî (bi devoka Qureyşî hatiye nivîsandin). Di vê pirtûka pîroz de 114 sûret û 6233 ayet hene û li 30 pişkî hatiye parvekirin. Ji her pişkekê re *cizû* tê gotin. Di her *cizûyekê* de jî çar hizb hene.

3- MEWLÛDA KURMANCÎ: Piştî kutakirina Qur'anê, Mewlûda Kurmancî tê xwendin. Mewlûda Kurmancî angî weladeta Mihemed Pêxember (sxl) bi naveroka xwe serpehatî ye ku Melê Bateyî tê de hin bûyerên dîrokî li gorî felsefa îslamê anîne zimên.

4- NÛBIHAR (NÛBAR): Ferhengoka mamosteyê nemir a Ehmedê Xanî ye (1651 -

1707) ku bi helbestî, hem jî bi kite û qafiye, bêjeyên erebî û kurdî bi xeysetê ferhengok nivîsîne. Xanî çewa ku wî bi xwe di paşiya Nûbarê de gotiye, di 11-ê Adara 1094- an (1683) de nivîsiye

5- NEHC-UL ENAM: Bi naveroka xwe baweriya (Eqîde) ola îslamê ye û ji aliyê Mele Xelîlê Sêrtî ve hatiye nivîsandin.

6- EQÎDEYA EHMEDÊ XANÎ: Çewa ku ji navê wê jî tê zanîn ev berhem, baweriya ola îslamê ye ku mamosteyê nemir Ehmedê Xanî ew bi helbestkî û bi zaravayê kurmançî nivîsiye. Tê de 73 malik hene, hemû bi kêş û qafiye û bi yazdeh kiteyan dikişin.

7- XAYET- UL ÎQTISSAR. Xwerû bi zimanê erebî ye.

8- ÎBNÛ QASIM, nivîskarê wê Îbnû Qasim Kurd bûye û xwerû bi zimanê erebî ye.

9- BACÛRÎ, nivîskarê wê Îbrahîm Bacûrî Kurd bûye, xwerû bi zimanê erebî ye.

10- TESRÎFA KURMANCÎ: Ev pirtûka bi zimanê kurdî li ser Serfa (Kîşandina lêkeran) erebî ji aliyê Mele Elî Teremaxî ve hatiye nivîsandin. Kesê ku wê pirtûkê dixwîne, hemûyî jiber dike.

11- EMSÎLE: Pirtûk bi zimanê erebî ye û li ser Serfa erebî hatiye nivîsandin.

12- IZZÎ: Pirtûk bi zimanê erebî û li ser Serfa erebî hatiye nivîsandin.

13- EWAMILA CURCANÎ: Ev pirtûk bi naveroka xwe Nehw (Gramatîk) e û bi zimanê erebî hatiye nivîsandin. Navê nivîskarê wê, Ebdulqadirê kurê Ebdurehman ê Gurganî (Kurd) ye.

14- ZURÛF (AMAN): Ev pirtûka bi zimanê kurdî, li ser Nehwa erebî ji aliyê Mele Ênisê Erqetênî (Kurd) ve hatiye nivîsandin.

15- TERKÎB: Ev pirtûka bi zaravayê kurmançî, li ser Nehwa erebî ji aliyê Mele Ênisê Erqetênî ve bi zimanê kurdî hatiye nivîsandin.

16- SE'DULLAHA SEXÎR: Ev pirtûka xwerû bi zimanê erebî, şerha 'Ewamila Curcanî ye ku Nehwa erebî bi awayekî firetir daye nasandin. Çewa ku ji navê wê jî tê zanîn, nivîskarê wê Se'dullah SEXÎR (Kurd) e.

17- ŞERH- IL MUXNÎ: Ev pirtûka Nehwa erebî xwerû bi zimanê erebî hatiye nivîsandin.

18- S'EDÎNÎ: Ev pirtûka Serfa erebî xwerû bi zimanê erebî hatiye nivîsandin. Herweha ew şerha pirtûka Izzî ye. Nivîskarê wê Se'dê Tevdezanî Kurd bûye.

19- HELL: Pirtûk bi naveroka xwe Nehwa erebî ye û bi erebiyeke pir hişk hatiye nivîsandin.

20- S'EDULLAHA GEWRA: Pirtûk bi naveroka xwe Nehwa erebî ye û bi zimanê

erebî, ji aliyê S'edullah Gewre (Kurd) ve hatiye nivîsandin.

21- NETAIC- UL EFKAR, felsefeya grekî (Yunan) ye û bi zimanê erebî hatiye wergerandin.

22- SIYÛTÎ. Xwerû bi zimanê erebî ye.

23- CAMÎ, xwerû bi zimanê erebî ye û ji aliyê Mewlana Mela Camî ve hatiye nivîsandin.

24- MUXNÎT`TULAB, mentiq e û bi zimanê erebî ye.

25- ÎSAXÛCÎ, mentiq e, nivîskarê wê Mele Xelîlê Sêrtî ye.

26- QEWEHMED, mentiq e û bi zimanê erebî ye.

27- 'USSAMA WEDD'Ê: Pirtûk, xwerû bi zimanê erebî ye; rewş û tertîba çêkirina tiştan dide zanîn.

28- 'USSAMA ÎSTÎ'ARÊ: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, rewş û tertîba çêkirina tiştên ne heqîqî (meczaz) dide zanîn.

29- ŞERHA WELÎD: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, bi naveroka xwe Mûnaqeşe û Munazzere ye,

30- HAŞIYA EBDULWEHAB xwerû bi zimanê erebî ye.

31- HAŞIYA USSAM xwerû bi zimanê erebî ye.

32- HAŞIYA EBDULHEKÎM: Pirtûk xwerû û bi zimanê erebî ye.

33- ŞERHŞEMSÎ, mentiq e. Nivîskarê wê, Se'dê Tevdezanî Kurd bûye.

34- MUXTESSER, felsefe ye, nivîskarê wê, Sedê Tevdezanî Kurd bûye.

35- ŞERH-UL EQAÎD: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, rewş û rêveçûna hemû baweriyên beyan dike û li dinyayê çiqas cûre bawerî hene tevek nivîsîne. Nivîskarê wê, S'edê Tevdezanî Kurd bûye.

36- CEM'IL CEWAMI': Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, bi naveroka xwe 'İlmê Usûlê ye; ji destpêka xwendinê hetanî vê pirtûkê, pirtûkên ku bihurîne kurtîneka wan tevan aniyê zimên. Tê gotin ku nivîskarê wê Kurd e.

37- ŞAFÎ (lûxet): Pirtûk xwerû û bi zimanê erebî ye.

38- ÎMTÎHAN (Nehw): Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.

39- EBÛTALIB (Nehw). Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.

40- ÎBNÛ 'UQEYL (Nehw). Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.

41- TESSRÎFA EREBÎ (Serf), nivîskar: Mele Elî Kurd bûye û xwerû bi zimanê erebî ye.

42- QIZILCÎ (Serf): Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, nivîskarê wê Kurd bûye.

43- QEREDAXÎ (Serf) Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye nivîskarê wê Kurd bûye.

- 44- DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ. Pirtûk bi zimanê kurdî ye.
- 45- MEM Û ZÎNa Ehmedê Xanî: Pirtûk xwerû bi zimanê kurdî ye.
- 46- RÎSALA HEMÎDÎYE: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.
- 47- ŞERHA LUBABÊ (Nehw): Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.
- 48- SITÛR, çêbûna Tiştan beyan dike, xwerû bi zimanê erebî ye, lê navê wê bi kurdî hatiye danîn ango mezin û qelew.
- 49- RÎSALA WED'Ê, Rewşa Çêbûna tiştan beyan dike, xwerû bi zimanê erebî ye.
- 50- RÎSALA ÎSTÎ'ARÊ (Mecaz û teşbîhan beyan dike, pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.
- 51- SILÊMANÊ KURDÎ, Şerî'et: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye. Ji aliyê Silêmanê Kurdî ve hatiye nivîsandin.
- 52- TENWÎR-UL QULÛB, Tesewuf, şêx Mihemed Emînê Hewlêrî nivîsiye.
- 53- ÎRŞAD-UL ÎBAD, Şerî'et, şêx Zeynedînê kurê Ebdulezîz ê Milêbarî (kurd) nivîsiye, xwerû bi zimanê erebî ye.
- 54- FETAWA ÎBNÛ HECER, şerî'et, îbnû Hecer bi zimanê erebî nivîsiye, heşt cild in.
- 55- MÎNHACUTTALIBÎN: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.
- 56- MUXNÎ- L MUHTAC, şerî'et, çar cild, şerha Mînhacê, xwerû bi zimanê erebî ye.
- 57- FETH- UL MÛ'ÎN, şerî'et, xwerû bi zimanê erebî ye.
- 58- Î'ANETUT`TALIBÎN, şerî'et, çar cild in, xwerû bi zimanê erebî ye.
- 59- BÛCEYREMÎ, şerî'et, çar cild in, xwerû bi zimanê erebî ye.
- 60- EL TEQRÎR: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.
- 61- EHYA- UL 'ULÛM: Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye.
- 62- ÎRŞAD- UL 'ÎBAD, şerî'et e, bi zimanê kurdî ji aliyê Xelîfe Êsiv ve hatiye nivîsandin.
- 63- TEFSÎRA CELALEYN ya Quranê.
- 64- TEFSÎRA SAWÎ ya Quranê, çar cild in.
- 65- TEFSÎRA CEMEL, ya Quranê, pênc cild in.
- 66- TEFSÎRA QAZÎ BEYDDAWÎ, ya Quranê, çar cild in.
- 67- TEFSÎRA ÎBNÛ KESÎR, ya Quranê çar cild in.
- 68- TEFSÎRA KEŞAF, ya Quranê duwazdeh cild in.
- 69- TEFSÎRA MENAR, ua Quranê yazdeh cild in.

- 70- TEFSÎRA FEXRÊ RAZÎ ya Quranê.
 71- TEFSÎRA XAZÎ ya Quranê.
 72- TEFSÎRA REMEL ya Quranê.
 73- TEFSÎRA MUHMEL ya Quranê.
 74- DURRET- UL WA'IZZÎN ya Quranê.
 75- RIYADDUS`SALIHÎN. Xerû bi zimanê erebî ye.
 76- DELÎL- UL FALIHÎN, heşt cild in.
 77- MUSLIM, hedîs e.
 78- BUXARÎ hedîs e.
 79- ÎBN-UL MUXTESSER.
 80- TACUR`RESÛL, pênc cild in.
 81- NÎHAYET-UL BÎDAYE.
 82- TEZKÎR-UL QURTEBÎ.
 83- FETAWA HEDÎSÎYE.
 84- NÛR-UL EBSSAR.
 85- XERPÛTÎ, ev pirtûka bi zimanê erebî, bi navê kevn ê Elezîzê ye.
 86- EL QERSÎ, ev pirtûka bi zimanê erebî, bi navê bajarê Qersê ye.
 87- SIYERUN`NEBÎ hedîs e.
 88- QISSES-UL ENBIYA.
 89- MUHEMMED RESÛL.

Zimanê Medreseya Kurdî

Di Medreseya Kurdî de zimanê sereke erebî û kurdî bûye. Lê zimanê farisî û hinek zimanê osmanî jî dihatin bikaranîn.

Lê di van demên dawiyê de hin belge ketin destên min ku zimanê Yunanî û yê Rûsî, eger bi hindikî bûbe jî, di Medreseyên Kurdî de hatine xwendin.

Ew pirtûkên bi zimanê erebî ku bi dersîtî dihatin xwendin, wergera tevan bi zimanê kurdî dihate kirin. Ev hawe, dibû sedem ku zimanê kurdî berepêş here û xurttir û dewlemendtir bibe.

Şagirdên Medreseya Kurdî, ji %70-80 kur/law bûne, yê din keç bûne. Bi piranî dersdarê keçan jî, jin bûne. Lê belê gelek caran dersdarên zilam jî, dersa şagirdên keç dane. Lê mixabin keçan, pir hindik dawî li xwendina medreseyê dihanîn.

Lê belê li hin deveran zanayên mezin jî ji keçên Kurd derketine. Wek mînak: Diya Feqiyê Teyran, xwendineke rind dîtiye û dersa kurê xwe Feqiyê Teyran daye.

Îdareya aborî ya Medreseya Kurdî.

Îdara aborî ya Medreseya Kurdî, weha çêdibû:

Me berê gotiye ku hinek Medreseyên Kurdî, yên mîrekan bûne.

Ew medreseyên ku yên mîrekan bûne, aboriya wan ji aliyê Mîran ve dihate kirin.

Ew medreseyên ku yên şexan bûne, aboriya wan ji aliyê xelkê ve dihate kirin.

Her maleke Kurd şagirdekî medresê ji xwe re wek kurê malê dipejirand û xwedîtî lê fikir, ha wisa hemû pêdiviyên wî şagirdî bi cih dianî.

Lê belê ew medreseyên ku ji aliyê weqfan ve dihatin xwedîkirin, rewşa wan erêna bûye.

NAVÊ ÇEND MEDRESEYÊN KURDÎ YÊN NAVDAR:

Çend Medreseyên Kurdî yên menşûr ku navê xwe di mêjû de bi cih kirine, ev in:

- 1- Medreseya Şêx Evdirehaman Baban
- 2- Medreseya Seyid Haşim,
- 3- Medreseya Sitrabasê (Diyarbekir),
- 4- Medreseya Sor (Cizîra Botan),
- 5- Medreseya Feqiyê Teyran li herêma Cizîra Botan,
- 6- Medreseya Bazîdê ya Ehmedê Xanî,
- 7- Medreseya Şemdîzan,
- 8- Pênc Medreseyên li Bedlîsê (Îxlasiye, Katibiye, Şukriye, Şerefiye, Şemsiye)
- 9- Medreseya Hîzanê,
- 10- Medreseya Mîksê (Mîr Hesên Welî)
- 11- Medreseya Bêdarê,
- 12- Medreseya Findika Botan,
- 13- Medreseya Axtepeyê, (em ê li dawiyê behs bikin)
- 14- Medreseya Norşênê,
- 15- Medreseya Oxînê,
- 16- Medreseya Qerekoyê,
- 17- Medreseya Çûxreşiyê,

- 18- Medreseya Farqînê,
- 19- Medreseya Hawêlê,
- 20- Medreseya Amêdiyê,
- 21- Medreseya Sêrtê,
- 22- Medreseya Heskîfê,
- 23- Medreseya Tiloyê,
- 24- Medreseya Paloyê,
- 25- Medreseya Zoqeydê,
- 26- Medreseya Arvasê,

û bi sedan medreseyên wisa yên din...

Hin kesên navdar ku ji Medreseya Kurdî derketine û bûne malê mêjû.

Ji wan medreseyên kurdî zanayên pir mezin derketine ku di nava gelê xwe de, hem jî li Rojhilata Navîn, xasma jî li cîhana îslamî navûdeng dane.

Ew kes, çi di warê olî û rêçikan (Terîqet) de be, çi di warê siyasî û serhildanên li pêşberî zulmê de be û çi jî di warê zanist, vêje û helbestvanîyê de be, karên pir hêja kirine.

Hin şexsiyetên wisa zana ji Medreseya Kurdî derketine ku ew êdî bûne malê dinyayê jî, wek:

1- Sitan Selahedînê Kurdî (1138-1193) ku niha wek hîmdarê duyemîn ê ola Îslamnê hatiye binavkirin.

2- Îsmail Cizîrî (1136-1206) ew wek bavê **robot** û **computerê** hatiye pejirandi ku dinyaya me îro bi xêra afirandina wî gehaye vê qonaxa pêşketinê.

3- Mele Goranî. Fehta Stenbolê jî bi hêza du Kurdan çêbûye. Yek **Mele Goranî** bûye (dersdar û şewirmendê Fatih Siltan Mihemed bûye-1453). Kurdê din îî, di fetha Stenbolê de serleşkerê fethê bi navê **Zagros** bûye.

4- Mewlana Idrîs Bedlîsî... hindarê Peymana Amasyayê 1514.

- **Mewlana Xalidê Kurdî** (1773-1826) hîmdarê duyemîn ê Rêçika Nexşebendî.

- **Melayê Cizîrî** (1570-1640) xwediyê dîwana bi şan û şaneşîn.

- **Feqiyê Teyran** (1590-1660) li dinyayê duyemîn kes bûye ku zimanê balinda dizanibû.

- **Ehmedê Xanî** (1651-1707).
- **Mele Seîdê Kurdî** (Norsî). Jînvêdêrê ola Îslamê yê Sedsala Bîst bûye.
- **Şêx Mehmûd Berzencê.**
- **Qazî Muhemed.**
- **Mistefa Berzanî**
- **Hezretê Norşênî** ku di Şerê Cîhanê yê yekem de 1914, serleşkerê giştî yê hêzên leşkerî yên bakûrê Kurdistanê bûye û li pêşber Çarên Rûs şer kiriye.

Herweha ev e çend kesayetiyan li jêrê ku berhemên Medreseya Kurdî bûne:

- Baba Tahir Hemedanî (938-1020)
- Elî Teremaxî (Sedsala IV, hicrî).
- Feqe Reşîd Hekarî.
- Mele Ehmed Huseyn Bateyî (1417- 1491).
- Mele Mehmûd Bazîdî (1797- ?)
- Mele Ênis Herqetênî (1785- ?).
- Mele Xelîlê Sêrtî (1753- 1843).
- Mûrad Xanê Bazîdî (1772- 1832).
- Pertew Begê Hekarî (?.. - 1806).
- Selîm Silêman (Sedsala 16- 17).
- Şerîfxanê Colemêrgê (1693- 1748).
- Şêx Abdulqadir (1908) Nehrî.
- Şêx Ubeydulah Nehrî.
- Şêx Ehmed Berzanî.
- Şêx Evdisselam Berzanî
- Şêx Elî Herîrî (1010- 10789).
- Şêx Evdirehman Axtepî (1850- 1910).
- Şêx Mehmûd Berzencî.
- Şêx Exlatî.
- Şêx Seîdê Pîranî.
- Şêx Ubeydulah Nehrî (1880).
- Seyîd Taha Nehrî.

- Xaris Bedlîsî (1758- ?)

Û bi sedan şaxsiyetên wisa...

SEDEMÊ RADANA MEDRESEYA KURDÎ ÇI BÛ?

Piştî 1925an, Mistefa Kemal bi navê "Kanuni Tedrisat"ê medreseyên kurdî dane girtin. Yekemîn sedemê girtina wan, heşifandin û pişaftina Kurdan û qutkirina wan ji her tiştên wan ên pîroz û nijadî, xasma bêxeberhiştina Kurdan ji pêşiyên wan bûye...

Li jorê hatiye gotin ku ev Sedsala Bîstî, wek **Sedsala Reş** di ser Medreseya Kurdî re bihuriye; Kurd ji hemû heyînen xwe bêpar mane û zext û zordestiya li ser zimanê kurdî, pê re jî pişaftin û helandina Kurdan, wisa çêbûye ku Kurd îro bûne biyanîyê ziman û çanda xwe.

Lê belê ev çar saziyên li jêrê, bi awayekî pir xurt Ziman û Toreya Kurdî parastine:

- 1- Medreseya Kurdî.
- 2- Rêçika Şêxantiyê.
- 3- Sazûmana Axatiyê.
- 4- Dibistana Zindî (dengbêj û çîrokbêj).

Hin ji van saziyan, li gor hinekan eger paşverû û kevnepereşt bin jî, lê rastiya naverokê ev e ku bi taybetî Medreseya Kurdî di radeya yekemîn de dilqekî mezin ji bo parastina Ziman, çand û Toreya Kurdî daye nîşandan û hertim wan zindî ragirtiye.

DEWLEMENDIYA ZIMANÊ KURDÎ

Zimanê Kurdî, bi xêra Medreseya Kurdî ye ku dewlemend bûye. Em dibînin ku piraniya peyvên kurdî du, sê û zêdetir hevwaterên (sinonim) xwe hene. Wek mînak:

- Peyva "**sivnik**"ê, di zimanê kurdî de **16 navên** wê yên cuda hene, ew jî ev in: *Sivnik, gezik, gêsik, bermalk, kinoşe, haolêk, avlêk, sizik, cerifk, simlik, mişteq, melkes, meknes, şijink, sirge, seqewêl, qarûşe.*

- Peyva "**serhişk**"ê, **14 navên** xwe yên cuda hene. Wek mînak: *Serhişk, sereq, lasar, riko, rikoyî, rikdar, girik, mirik, cazgir, rûsirtik, sehend, mangir, birandoz, kelereq.*

- Peyva "**milêb**" **10 navên** xwe yên cuda hene. Wek mînak: *Sêgulî, milêb, milhêb, şene, dirgan, sêtilî, duguh, çitel, pêçok, neperûşk.*

Ev dewlemendiya Zimanê Kurdî digel Toreya Kurdî ku xwe heta îro jî li ser

nigan ragirtine û diparêzin, di radeya yekemîn de qerzdarê Medreseya Kurdî ne.

MEDRESEYA AXTEPEYÊ

Medreseya Axtepeyê, di çarîka pêşî ya Sedsala 19an de, ji aliyê **Şêx Hesênê Nûranî** ve (1786 - 1866) li gundê Axtepeyê hatiye avakirin.

Şêx Hesên piştî ku li Bazîdê destûrnameya xelîfetiya Nexşebendî ji **Şêx Salihê Sîpkî** wergirtiye, çûye gundê Axtepeya girêdayê bi Çinara Diyarbekirê ve, li wirê medreseyeke bi rêkûpêk ava kiriye. Herweha Şêx Hesên aboriya Medreseya xwe jî, bi qezenca 52 perçe zevî daye kirin.

Şêx Hesên ji ber ku zanayekî pir dagirtî bûye, hem ders daye şagirdan, hem jî îrşad kiriye. Ji ber hindê ye ku jê re gotine **Şêx Hesênê Nûranî**.

Dema Şêx Hesênê Nûranî wefat kiriye, kurê wî Şêx Evdirehman Axtepî (1850-1905) hêj 12-13 salî bûye. Îcar li Medreseya Axtepeyê, ders ji aliyê **Mele Selîm** û Mele **Mihemed Emîn** ve hatine dayîn heta kurê wî Şêx Evdirehman Axtepî xwendina xwe kuta kiriye û hatiye li Medreseya Axtepeyê dest bi dana dersan kiriye.

Di vê malbatê de ji ber ku fikra xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî ji bapîrê malbatê dest pê bûye, piştî Şêx Hesênê Nûranî, kurê wî Şêx Evdirehman Axtepî jî, kultura xwendin û nivîsandinê, li Medreseya bavê xwe geştir û şêntir kiriye.

Di Medreseya Axtepeyê de, gelek zimanên cuda hatine bikaranîn. Di lêkolîna min a li ser Medreseya Axtepeyê de, derket holê ku ji zimanê kurdî, yê erebî, farisî û osmanî zêdetir, tê de zimanê rûsî û yê yunanî jî hatine bikaranîn.

Yanî xwendin di vê medreseyê de bi 6 zimanan dihate kirin.

Şêx Evdirehman Axtepî:

(http://ku.wikipedia.org/wiki/%C5%9E%C3%AAx_Evdirehman%C3%AA_Axtep%C3%AE)

Eger em hinekî behsa Şêx Evdirehman Axtepî bikin, tê dîtin ku ew mirovekî pir zana, dûrebîn û rewşen bûye. Wî bi destê xwe gutleke grover ji dara gûzê ya vê dinyayê çêkiriye û li serê parzenîn û welatan daye nîşandan. Herweha wî salnameyek jî çêkiriye û ji me re diyarî hiştiye.

Şêx Evdirehman Axtepî, li Diyarbekirê wek **Reîs-ul Ulema** ango serokê zanayan jî hatiye îlankirin.

Şêx Evdirehman Axtepî, pir xwestiye ku zarûkên Kurdan bixwînin û zana bibin.

Ji ber hindê, eşkere tê dîtin ku ewî jî daye pey rêça Ehmedê Xanî.

Dema **Şêx Mihemed Can** (1858-1909) li Şamê destûrname û xelîfetîya nexşebendî ji Tekyaya Mewlana Xalid wergirtiye, vegeyriyaye hatiye Axtepeyê. Îcar Şêx Evdirehman hem dersdanê û hem jî şêxantiyê sipartiye wî. Îcar Şêx Evdirehman bi temamî xwe daye ser nivîsandinê û bi zimanê kurdî û erebî, berhem afirandine.

Lê mixabin Şêxê gorbihîşt di temenekî ciwan de (55 salî) çûye ber dilovaniya Xwedayê mezin.

Lê mixabin hêj di salên 1939-40î de leşkerên Kemalîzmê avêtine ser Medreseya Axtepeyê û wê Arşîva mezin serobin kirine û çî pirtûkên kurdî dîtine, ji navê derxistine û li navrasta gund kom kirine, li ber çavên gundiyan şewitandine.

Herweha hêzên Kemalîzmê ew arşîv ji bîr nekirine û dema Cuntaya Leşkerî ya 1961, 1971 û 1980ê jî ku çêbûne, dîsa avêtine ser gundê Axtepeyê û piraniya pirtûkan birine.

Niha salixê kitêbeke Şêx Evdirehman li bajarê Muglayê hatiye hildan. Ev kitêb li ser derd û dermanan hatiye nivîsandin, di wê kitêbê de ango kîjan giya dermanê kîjan êşê ye dinivîse. Herweha salix hatiye wergirtin ku hin kitêbên Şêx Evdirehman ên din jî, li bajarê Konyayê ne.

Berhemên Şêx Evdirehman Axtepî yê ku niha di destên min de ne, ev in:

a) **Rewdneîm**

Ev pirtûka bi navê **Rewdneîm** ya herî mezin e û xwerû bi zaravê kurmançî ye. Di 1886an de hatiye nivîsandin. Tev rîwayetên kevnare ne ku bi helbestkî li ser jiyana Mihemed Pêxember (xxxl) nivîsiye. Xasma tê de rewşa çûn û hatina ji Mîracê beyan kiriye. Lê belê di nava wan helbestên olî de, Şêxê me hin car qelema xwe kiriye şûr û pê êrîş biriye ser rewşenbîrên Tirk û Ereb û Faris jî.

Di pirtûkê de 35 beş hene. Babeta her beşekê jî cuda ye û 4531 malik in. yani 9.062 rêz in.

Rewdneîm wek kêşa Mewlûda Kurmançî ya Melayê Bateyî, malikên wê tev bi yazdeh kiteyan dikişin, gelek rewan in, bi kêş û qafiye ne. Her du rêz, bi eyni tîp qafiye ne, bi zarekî şêrîn û bi nikleka pir xweş li pey hev didomînin.

Şêx Evdirehmanê Axtepî, çewa ku wî bi xwe di helbestekê de beyan kiriye, pirtûka xwe ya Rewdneîm di sala 1302yên Koçê (1884) de nivîsiye.

Min ev pirtûk di sala 1988an de ji tîpên Erebi veguhaztiye tîpên Latêni û di 1991ê de ji li Swêde daye çapkirin. Ev çap 438 rûpel e.

(Şêx Evdirehmanê Axtepi, Rewdneim, Kurdî, Sverige/Stockholm, 1991, 440 rûpel, ISBN 91-830062-0-0. Tîpguhaztina ji alfabeya erebi: Zeynelabidin Zinar.)

b) Dîwana Rûhî

Ev pirtûka Şêx Evdirehmanê Axtepi, bi navê Dîwana Rûhî hatiye naskirin. Çewa ku li pêş ji hatiye gotin, *Rûhî* nasnavê Şêx Evdirehmanî ye ku wî di helbestan de ji bo xwe bi kar aniyê. Dîwan di sala 1293ê Hicrî (1876) de hatiye nivîsandin. Bi tevayî 28 beş in û 471 malik in, tev bi kêş û qafiye ne û kiteyên wan bi jmar in. Her beşek li ser jimareke kifş bi kiteyan dikişê û hin malikên pêncok ji tê de hene.

CARA Pêşî MIN EV DÎWAN DI sala 1988an de, ji tîpên Erebi veguhaztiye tîpên Latêni û di yek salê de ji, weşanxaneya "Jîna Nû" di meha Êlûnê de li Swêde, bajarê Uppsalayê çap kiriye.

(Şêx Evdirehmanê Axtepi, Dîwan, Kurdî, Jîna Nu, Sverige/Uppsala, 1988, 140 rûpel, ISBN 91-970927-6-2. Tîpguhaztina ji alfabeya erebi: Zeynelabidin Zinar.)

c) Kitabu Keşfîz'zelam

Ev pirtûka Şêx Evdirehman xwerû bi zmanê Erebi ye û li ser fikra baweriyên cuda yê di ola îslamê de hatiye nivîsandin. Pirtûk 35 rûpel e. Lê heta niha jî çap nebûye

d) Kîtab ul-Ebrîz

Şêx Evdirehman Axtepi, vê pirtûkê ji bi zimanê Erebi nivîsiye. Li ser eyîşandin û îsbata Quranê ye ku pirtûkeke asîmanî ye û ku ji aliyê Xwedê ve, ji Mihemed pêxember re hatiye hinartin. Pirtûk 81 rûpel e û heta niha çap nebûye.

Şêx Evdirehman Sedemê Nivîsandina bi zimanê kurdî weha beyan kiriye:

Helbestvan û nivîskarê nemir Şêx Evdirehmanê Axtepi, sedemên herî girîng ku ev pirtûk nivîsîne, hin jê ev in ku li layêt welatparêzî bi hin helbestên xwe eşkera gotiye:

**Ji van qesdê min nîne 'erzê huner
Welê da li dunya bimînit eser**

**Ku Turk û Ecem qet nebên carekê
"Nehin Kurdî şa'ir di misra'ekê"**

Bizanin ku şa'ir ji Kurdan hene
Ji 'uşşaqê Turk û Ecem zêde ne

Binêrin li şî'ran heçî zaniye
Çi terkîbekî serfê kurmancî ye

Ji kurmanciya xwe me anî nîzam
 Mu'ella û şêrîn û efseh kelam

Ji tenzîmê kurdî sual û cewab
 Me bînane nezmê hezaran kîtab

Welê îktîfa kir ji nezmê hemîn
 Çiku kes nehîn bêje min "aferîn"

Gelek caran jî Axtepî li ser vexwarina bade û meyê, herweha daketina meyxaneyê
 û li ser evîna xwe jî çend malik weha gotiye:

Were ey qelem ser siyaqa ewil
 Tu jî saqiya bîne cama çu gul

Ku seccade û xerqe û sebheyê
 Bikim rehnê bade di meyxaneyê

...

Ev çend malikên li jêrê, jêderkên ji Dîwana Şêx Evdrihmê Axtepî ne:

...

Da çêbitin der dil tereb
 Turk û Ecem, Rom û Ereb
 Guh din bi qanûnê edeb
 Ser ah û kovan û keser.

...

Axtepî li ser evîna xwe di Dîwanê de jî weha gotiye:

...

Ji dil daxwazê yarê me
 Qewî mexmûrê badê me
 Murîdê saz û badê me
 Bi îxlasê temennayê.

...

Bi qurban bim ji bona çeşmê şehla qameta yekta
Di her wext û di her gavan di nîva sar û sermayê

...

Îd e, keyf û şahî ye, nêv xas û amê xulxul e
Yek yekan aşiq li ser sorgul mîsalê bulbul e...

...

Turk û Tacik û Qeçer ber milkê dil anîn hucûm
Pey bi pey, saet bi saet xaretê Kurdan dikin

Şêx Evdirehman li dij xurafetiyê jî derketiye û weha bûye:

Dibêjin: Carekê çend sofî çûne ba Şêx Evdirehman û gotine wî:

- Qurban hûn li asîmanan nîsk û nokên xwe diçînin.

Şêx Evdirehman jî gotiye wan:

- *Lê gayên cot li asîman çewa rêx û mîza xwe dikin?*

Sofiyan gotiye:

- Em nizanin!

Şêx gotiye wan:

- Rêxa xwe li ser rihê şêxê we dikin!

Sofi tev şermezar bûne û rabûne ji ba şêx Evdirehman çûne.

ŞÊX MIHEMED CAN (1858-1909)

http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Mihemed_Can&variant=ku

Şêx Mihemed Can roja 13yê Şe'wana 1274ên Koçê, li Axtepeya girêdayê bi qeza Çinarê ve hatiye dinyayê. Ev tarîx li pêşberê ya Zayînê dike 29î adara 1858. Şêxê nemir di 21ê Adara 1325ê Romî de de jî çûye ber dilovaniya Xwedê. Ev tarîx jî li pêşberê ya Zayînê dike **03. 04.1909**

Mihemed Can kurê Şêx Hesênê Nûranî ye, navê diya wî Şerîfe xanima keça mele Hesên e û birayê bindest ê Şêx Evdirehmanê Axtepî ye.

Ji xeynê Şêx Evdirehmanê Axtepî û Şêx M. Can, du kurên Şêx Hesênê Nûranî yê din jî hebûne. Yek **Şêx Mihemed Sîrac** e û yê din **Şêx Mihemed Nûr** e.

M. Can xwendina Wî destûrnameya xwendinê ji dersdarê menşûr **Mele Mihemedê Kurmuşluyê** wergirtiye.

Piştî wergirtina destûrnameya xwendinê, M. Can xelîfetiya rêçika Nexşebendî ji kekê xwe Şêx Evdirehman Axtepî wergirtiye. Lê ji bo teberuk, kekê wî ew hinartiyê Şamê wargeha Mewlana Xalidê Kurdî, piştî demekê xelîfetiya rêçika Nexşebendî ji wirê jî wergirtiye.

Piştî wergirtina xelîfetiye ji Tekyaya Mewlana Xalid, Şêx M. Can bi şûnde vegeyriyaye gundê xwe Axtepeyê û li şûna kekê xwe Şêx Evdirehman, di Medreseye de desdarî kiriye ta ku çavên xwe ji dinyaya ruhnîk girtine.

Pirtûka Şêx Mihemed Can **Leyl û Mecnûn** e. Ev pirtûk, hetanî 1992an jî ruyê rojê nedîtîye ta ku gihaşte destên min û min ew ji alfabe ya erebî veguhazt a latênî.

Ev teksta pirtûkê ya destnivîsa bi tîpên erebî, 148 rûpel e, digel beşa destpêk û ya dawî, tê de 19 sernav û **1882** malik hene. Helbestên wê hemû xweşxwîn û rewan in; bi deh kiteyan dikişin û qafiyeya her du rêzên malikan jî yek e, di 1302an (1884) de jî kuta bûye.

Şêx Mihemed Can pirtûkek bi nava **Medhiye** jî, li ser **Rewdneîma** kekê xwe Şêx Evdirehmanê Axtepî nivîsîye.

Şêx Mihemed Can di destpêka pirtûka xwe de sedemê nivîsandina bi zimanê kurdî weha beyan kiriye:

....

*Kurmancî qesaidê di mewzûn
Behsê bikin em ji halê Mecnûn.*

*Turkî hene, nîne kurdewarî
Kurdî wekî kenzeke veşarî*

*Qet nîne kesek ji xelqê Ekrad
Leylasîfet ew bi ah û feryad?*

*Işqê qe nekirine ew belakêş?
Hicrê qe nekirine ew cîgerrêş?*

*Min dî hene, lêkî bê mecal in!
Puraqil û sahibê kemal in!*

*Sahibhuner û xwedanhewes bûn
Lê şubhetê teyrekî qefes bûn!*

*Wan nîne muşîr û ne debîrek
Ne padîşehê, ne wan wezîrek!*

*Peyda bikira ger me emîrek
Sahibhuner û xwedanê şîrek*

*Ev Turk û Ereb, Tetar û Faris
Carek bibûna li ber me naqis*

*Her şairekî zebanê Kurdan
Qet nayê ji halê wan xeberdan*

*Her şî'r û qesîde dê bigota
Dunya ser û bin hemî bisota*

...

Şêx Mihemed Can behsa camêrî û merdiya Kurdan ji weha gotiye:

...

*Ew çend sexaweta li erdan
Bîl cumle Xwedê didaye Kurdan*

*Ekradîsîfet sexî tunin qet
Wan qehwe diçin bi şubhetê şet*

*Ne Ce'ferê Bermekî, ne Hatem
Qet nîne kesek ji neslê Adem.*

...

ŞÊX HESÎB

Şêx Hesîb Axtepî (1885 – 1947)

http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Hes%C3%AEb_Axtep%C3%AE&variant=ku

Şêx Hesîb Axtepî di **1301ê** Romî (1885) de, li **Axtepeya** girêdayê bi qeza Çinara Diyarbekirê ve, hatiye dinyayê, di **1947an** de jî, li Çinarê çûye ber dilovaniya Xwedê. Niha gora wî li goristana Şêx Hesênê Nûranî ya li gundê Axtepeyê ye.

Hesîb kurê **Şêx Mihemed Can** e, birazîyê **Şêx Evdirehmanê Axtepî** û neviyê **Şêx Hesênê Nûranî** ye. Şêx Mihemed Behçed û Şêx Mihemed Munîr jî birayên wî bûne.

Hesîb pêşî li ba bavê xwe Şêx Mihemed Can xwendiyê, piştê li Medreseya navdar ya **Axtepeyê** li ba mamê xwe Şêx Evdirehmanê Axtepî xwendiyê, heta ku Xwendina Rêzê kuta kiriye û destûrnameya (îcaze) xwendin û ya Xelîfetiya Rêçika Nexşenbî wergirtiye.

Ji xwendin û zanîne zêdetir, Şêx Hesîb rûmeteke mezin daye pirtûkan û pirtûkxaneya xwe pir dewlemend kiriye. **Li gor tê gotin, di pirtûkxaneya wî de bi hezaran pirtûkên cihê hebûne.** Lê mixabin Leşkerên Komarê piraniya berhemên pirtûkxaneya Şêx şewitandine.

Şêx Hesîb sê pirtûk bi zimnê kurdî û nusxeyek jî bi destên xwe ji ber Dîwana Melayê Cizîrî nivîsîne.

P irtûkeka wî bi navê **Simbil û Dîwaneka wî** di 1971ê ji aliyê Leşkeran ve hatine şewitandin.

Dîwaneka Şêx ji şewitandinê rizgar bûye û min ew veguhaztiye alfabeya Latênî, ji aliyê weşanxaneya DOZê ve çap bûye. Di vê Dîwanê de **94** beş, **1.235** malik(ên durêzî), **318** malikên çarîne, **30.130** peyv, **113.635** tîp û **6.000** rêz hene ku her yekê ji van, bi naveroka xwe pir dewlemend, babetekihê û bi tewrekî xweş hatiye honandin.

ŞÊX MIHEMED KERBELA 1885-1939)

http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Mihemed_Kerbela&variant=ku

Şêx Mihemed Kerbelayê helbestvan û nivîskar, herweha mêrxasê bi navûdeng, di sala **1885an** de, li gundê Axtepe ji diya xwe re çêbûye û di sala **1939an** de jî, li gundê Çolê çûye ber dilovaniya Xwedê, li gudê Axtepe di wargeya xwe ya timî de dimîne.

Şêx Kerbela kurê Şêx Evdirehmanê Axtepi ye. Lê ew bi Şêxîtiyê qewî nehatiye naskirin. Di nava xelkê de, jê re Mihemed Kerbela, yan jî Kerbelayî dihate gotin. Herweha ew alim û zanayekî gihaştî bûye. Xasma di warê zanîn û dersdana feqîyan de, şûna bavê xwe dagirtiye.

Muhemd Kerbela li paş xwe du pirtûkên granbiha ji me re diyarî hiştine. Yek **dîwanek** e û ya din jî ferhengokeka Kurdî-Farisî ya bi navê **MÎRSAD-UL ETFAL** e. Wî ew Ferheng di sala 1912 an de nivîsîye. Her çiqas pirtûk bi xwe ferheng e, lê wek NÛBARa Ehmedê Xanî, bi kêş û qafiye û kite, bi helbestkî nivîsîye. Tê de li dor 1350 bêjeyî hene. Navê wê, bi mana riya (papûr) piçûkan e.

Min ev pirtûk veguhaztiye tîpên latênî 1989an de li Swêdê weşanxaneyê Jîna Nû çap kiriye. Diwana wî jî hê nehatiye weşandin.

ŞÊX MIHEMED ESKERÎ (1898 – 1952)

http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Eskeri&variant=ku

Şêx Eskerî di 1316an (1898-1899) de, li gundê Axtep hatiye dinyayê û di 1952an de jî çûye ber dilovaniya Xweedê û gora wî ya pîroz niha li gundê Çolê ye.

Şêx Mihemed Eskerî kurê **Şêx Evdirehmanê Axtepi** ye. Wî xwedina xwe ya destpêkê, li ba bavê xwe xwendiyê û piştê di Medreseya Axtepeyê de li xwendinê domandiye. Piştî ku bavê wî çûye ber dolovaniya Xwedî, îcar li ba kekê xwe Şêx Kerbela xwendiyê.

Şêx Mihemed Eskerî pênc berhem bi kurdî nivîsîne.

a) **Iqdê Durfam.**

Ev pirtûk ji aliyê min ve hatiye veguhaztin bi alfabeya Latênî û ji aliyê Weşanxaneyê Apec- tryckê ve jî li Swêd/Stockholmê (1989, 203 rûpel, ISBN 91-877301-6-2) hatiye çapkirin. (www.pencinar.se) B/12.

b) **Keşkol.**

Ev pirtûk ji aliyê min ve hatiye veguhaztin bi alfabeya Latênî û ji aliyê Weşanxaneyê DOZê ve jî li Stenbolê hatiye weşandin.

c) **Memozîna Ehmedê Xanî.**

Şêx Eskerî nusxeyek ji ber Memozîna Ehmedê Xanî nivîsiye.

d) **İlmê Ehwalê Berq û Burûsk û Baran, Qews û Qezehê.**

Şêx Eskerî bi xwe gotiye: *"Min kitabek İlmê Ehwalê Berq û Burûsk û Baran, Qews û Qezeh ku filan weqtê wuha derkeve weya yê wusan dibe..."* nivîsiye.

e) **Dîwana Helbestan**

Ji van berhemên ku behsa wan li jorê hatiye kirin, ji xên *Iqdê Durfam* û *Keşkolê*, min yên din nedîtine.

Şêx Eskerî di beşa 41ê de, ji bo debara xelkê, kar û kiryarên wan, ev şîret û qewîfî kirine:

*Çendan şecera sebrê gelek tal e, sebir ke
Ta meywe ku da, xwoş tu bixwo, şeker û noş e*

*Dunya bi yeqîn mezre'e ye tişkî biçîne
Nabînî kesên ku nebit qûti, mirî ne!*

Herweha ji bo vîna evîndar û meyê jî Şêxê Nemir weha gotiye:
*Saqî yû mey û yarê bihebîn, Abi Heyat e
Qûtê dil e, ev e se'yê ke, nê av e, ne nîne!*

Şêx Eskerî derbarê xemxuriya zimanê kurdî de jî, wha gilî û gazinan kirine:
*Bîl xasse, bi nezmê kurdewarî
Qet kes nekirî mereq û yarî*

*Bîl cumle kitab û şî'rê Kurdan
Bê qedri dibûn li cumle erdan*

*Ew ketne ziyade ber piyan tev
Reşbexti weh mane şubhetê şev*

Gorbihişt Şêx Eskerî di beşa 43an de, Silsileya Xelîfetiya Rêçika Nexşebendî, ji **Nebî Sidîq** heta bigîje mamê wî **Şêx Mihemed Can** Axtepî, bi helbestkî weha daye xuyakirin: "Nebî Sidîq, Selman, Qasim, Ce'fer, Teyfûr, Ebul Hesên, Elî, Yûsuf Gencûr, Ebdilxaliq Amedi, Arif, Mehmûd, Elî, Babakulal, Elauddîn, Şêx Yaqûb Çerxî, Xwaceh Ehrar, Şêx Muhemmed Zahid, Şêx Derwêş, Şêx Muhemmed Xwace, Baqî, Şêx Seyfuddîn, Şêx Seyid Nûr, Şêx Ebdullah Dehlewî, **Mewlana**

Xalid Şehrîzûrî, Şêx Xalid Cîzîrî, Şêx Behauddînê Sanî, Şêx Hesenê Nûranî, Şêx Evdirehmanê Axtepe- Rûhî, Şêx Muhemmed Can Axtepe."

Axaftina xwe bi **Şêx Mihemed Sîrac bi dawî tînim:**

Şêx Mihemed Sîrac

Min zêde agahdarî li ser vî zatê hanê, bi dest nexistiye. Min bihîztiye ku wî jî berhem nivîsine, lê agahdariya min bi jimara wan û zimanê wan çênebûye.

Spas ji bo ku min hinek ji zemanê we girt, her şad û bextewer bin...